Shelter Sector Türkiye
ShelterCluster.org
Coordinating Humanitarian Shelter

Temporary Settelment Support Sector
Türkiye

# 2023-24 PEYAMÊN GIRÎNG

**Ji bo ku vê zivistanê germ û ewle bimînin serişteyên hêsan**

Zivistan li vir e! Niha dem hatiye ku di zivistanê de xwe amade bikin ku germ û ewle bimînin. Her çend hûn ne li mala xwe ya adetî bin jî, hin tiştên hêsan hene ku hûn dikarin bikin da ku hûn germ û ewleh bimînin.

### Enerjiyê teserûf bike

- ✓ Ji bo kêmkirina windabûna germê, valahiyên li derûdora deriyan bigirin.
- ✓ Ji bo parastina germa hundir pencereyan girtî bihêlin.
- ✓ Li cihê hûn lê dimînin, valahiyên di erd û diwaran de hebin ku bibin sedama windabûna germê tespît bikin û bigirin.
- ✓ Dema deriyê derve hat vekirin ji bo parastina têhna hundir, valahiyên aliyê hundirê derî bi betaniyekê an jî bi parçeyekî plastîkê bigrin.
- ✓ Ger derfeta îzolasyonê hebe, divê ev yek ji derve ( ne ji hundir ve) ve bê kirin da ku germa hundir zêdetir bibe.

### Germkirina Guncaw

- ✓ Dema germkirina hundir de ewlehî mijara herî girîng e ku divê hûn hay jê hebin.
- ✓ Sobeyên ceyranê, bêyî qoqên li derve, divê girtî (weke sobeyên bi rûn) bin. Qoqên li derve heye bigihîjin qûmaş an jî hin madeyên din û bibin sedema derketina agir.
- ✓ Heke hûn ocaxê bikar bînin, madeyên ku dibe gazên bijehr derbixin yên weke tekstîl û plastîkê neşewitînin.
- ✓ Sobeyên ceyranê û ocax ji bo rêlibergirtina derketina agir divê ji dîwar û tiştên din (herî kêm 50 cm) dûr bin. Ger mimkun be, ocaxan li cihekî ku ji bo çêkirina xwarinê hatiye diyarkirin bihêlin.
- ✓ Ji bo zarokên biçûk bi kelûpelên germahiyê neleyzin bergiriyên ewlehiyê bigirin. Sotemenî û maddeyên din yên ji bo agir divê dûrî ocax û sobeyan bên veşartin.
- ✓ Li jûreyên razandinê ji bo germbûnê manqelên komirê bi kar neyênin.
- ✓ Li hundir pêtan nehêlin. Mûm an jî pêtên piçûk yên din heye bigihîjin/bipekin lampe yan jî şûşeyan. Dema razandinê yan jî dema hûn ji cihê lê dimînin vediqetin, qet li pey xwe pêtan nehêlin.
- ✓ Ger mimkun be hewl bidin li stargeha xwe an jî li nêzî wê vesînereke agir hebe ku hûn bikaribin bi hêsanî xwe bigihijînê û fêr bibin da di rewşeke awarte de hûn dê çawa bi kar bînin.
- ✓ Di egera derketina agirekî li hundirê stargehê de bizanibin ev yek dê bi awayekî bi ewle çawa were kontrol kirin û vê zanyariyê bi hemû kesên derûdora xwe re parve bikin. Nexşereyeke revê saz bikin û vê nexşereyê vekirî, li ber dest bihêlin.
- ✓ Ger agirek derkeve hemû kesan derxin derveyî stargehê, piştre jî ji bo kontrolkirina agir, derî û paceyan ( ji derve ve) bigirin.
- ✓ Heke sobeyên komir, dar û xazê tên bi kar anîn, vanan her gav hewadar bikin û piştrast bin ku dû di ber wan re naye. Hay ji talûkeyên weke karbon monoksîtê hebin.
- ✓ Pê ewle bin ku kulek sabît in û dû ji stargehê dûr dixin.

### Stargehê ji cihê têketina avê / ji lehiyê biparêzin

- ✓ Ji bo parastina stargehê ji herikîna avê, li derûdora stargehê dranajan (sîstema bo çûyîna avê) bikolin. Ger hebe vanan bi yên duyemîn û sêyemîn ve girê bidin.
- ✓ Giraniya berfa ku li ser banî kom bûye dibe sedema hilweşîna banan li cihên demkî yên wekî konteynir. Berfa kombûyî bi rêkûpêk paqij bikin.
- ✓ Ji bo av nede ser konan û stargehan, ku gelekî ne sexlem in, herwiha ji bo pêşîlêgirtina germa hundir, bi rêya texteyan van stargehan ji erdê bilind bikin.
- ✓ Ji bo konteyneran ji bo pêşîlêgirtina lebatê û parastina germê, movikên bi bantê an jî sîlîkon an jî pûtî.